


zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT





## PEYVÊN BERVAJIYÊN HEV

Di zimanê kurdî de pir gotin û peyvên bervajiyêñ hev hene. Ji bo pêşdebirina zimêñ û dewlemendtir kirina xezîna peyvan divê mirov wan peyvên bervajiyêñ hev qenc bizane. Mirov wan çendî zêdetir bizane, xezîna peyvên mirovî jî ewçend dewlemendtir dibe. Ji lew re, em ê di çend hejmarêñ kovarê de, hem li ser peyv û hem jî li ser lêkerêñ ku bervajiyêñ hev in, rabiwestin.


### PEYV

reş  
dirêj  
zirav  
rast  
rast  
rast  
piçûk  
sar  
keç, keçik, qîz  
rojhelat  
bakur  
qelew  
dewlemend  
fer  
kit  
rûges  
ber

### BERVAJÎ

spî  
kin, kurt  
stûr  
çep  
xwar  
derew  
mezin  
germ  
kur, lawik, law  
rojava  
başûr  
jar  
hejar, belengaz  
zo  
cot  
rûtîrş  
kêmber


# NAVÊN HIN HEYWANÊN NAVMALÊ



BAV : Beran

DÊ : Mî, mih


ZAROK : Berx, berxik



BAV : Nêrî

DÊ : Bizin


ZAROK : Kar, karik



BAV : Dîk, keleşêr,dîkil

DÊ : Mirîşk

ZAROK : Çîçik,çêlik,cûcik



BAV : Hesp

DÊ : Mehîn


ZAROK : Ciwanî,canî,kurte



BAV : Ga

DÊ : Çêlek, manga

ZAROK : Golik






BAV : Se,seg,kuçik

DÊ : Dêl, dêlik

ZAROK : Çêlik,çêl,cewrik

# M I J Ü L İ

CÊWİ



Di nav van simoreyan(sihûrî) de du lib hene ku  
cêwî ne. Gelo kîjan in ?

## TOZ BEG

Carekê, cebarekê,  
Cil kew firîn ser darekê,  
Car hate caran,  
Xeber hate zaran,  
Sêvên sor para,  
Heval û guhdara.

Hebû tunebû, rehmet li dê û bavêne me û we bû ...

Di wextekî berê de qeraşek hebû. Aşê wî li serê çiyayekî bilind bû. Salekê, zivistanê pir berf hat û rê hemû hatin girtin. Kes nikarîbû bihata êş. Qeraş li serê çiyê û di aşê xwe de bi tenê mabû. Xwarina wî jî qediyabû û dikir ji nêz de bimire.

Qeraş serê sibehhekê rabû, çavêne xwe li der û do-rênen êş gerandin û bi xwe ji xwe re got, ku "Çika ez li çaviya êş mîze bikim. Dibe ku çengek ard di keviya êş de mabe, da ku ez ji xwe re bipêjim û bixwim." Wî destê xwe xiste çaviya êş. Destê wî ji nişkê ve çû ser tiştekî nerm û xwar bû ku lê mîze bike. Wî dît ku va ye roviyek xwe tê de ve-dişêre. Hema hişk bi qirika rovî ve girt û jê re got :

- Pa Xwedê te ji min re şandiye. Ez ê vê ga-vê te ser jêbikim, bigurînim û bixwim !

Dema ku qerêş wilo got, rovî qutifî. Bi awakî he yîrî piçekî li xwe hizirî û bi dû re ji qerêş re got :

- Birakê qeraş, tu dê bi min pir-pir du caran têr bixwî. Lê tu dê rojên din çi bikî ? Tu dê li serê vî çiyayê rût çawan de bara xwe peyda bikî ? Ka tu min azad bike, ez ê ji qencîke wilo li te bikim, ku tu heta bi hetê ji bîr ve nekî !

Qeraş bîskê ji xwe re hizirî û bi xwe ji xwe re got, ku "hey ez birçî me. Bila ez çend rojên din jî birçî bimînim. Ma ez ê ji birçîna bimirim ?.. Na !.. Ca ez vî roviyî serbest berbidim, heye ku ew bi rastî jî qencîkê li min bike !.." Wî rovî berda...

Zivistan çû û bihar hat. Dinya xweş û geş bû. Si behekê qeraş ji xewê rabû, misinê xwe hilda û be rê xwe da ber bi derve. Deriyê êş vekir û nihêri ku va roviyê wî li ber deriyê êş vezeliyaye. Rovî di cîh de rabû ser lingan, silav û rojbaşî da qerêş û jê re got :

- Birakê qeraş, deriyê êş bigire û bide dû min !

Qeraş li roviyê xwe ma heyîrî û lê vegerand :

- Rovî, lawo ez ê vê sibeha Xwedê werim kû? Ez ê çawan kar û aşê xwe berbidim û bidim pey te malkambaxî ? Ma tu dîn i yan bi aqil i ?

Rovî bi hêrs ket û di ser qerêş de qêrî û got :



- Guhdariya min bike ! Min ji te re çi got,  
wisan bike ! Karê te jî bi tu tiştekî din  
tune ye !

Qerêş ji tırsa rabû deriyê êş dada û da dû rovî.  
Em bêjin pir çûn, hun bêjin hindik çûn, gihîştin  
ber çemekî mezin î wek çemê Feratê. Berfa çiyên  
li hawîrdor nû bihujîbû. Ava çêm rabûbû, xumxuma  
avê bû. Rovî gote qerêş :

- Birakê qeraş, tu wan kincên xwe di avê de  
berde û têkeve çêm û serê xwe bişo !

Qeraş :

- Rovî, ez ê çawan kincên xwe di avê de ber bidim ? Malxirabo, ne ez ê paşê jî bi rût û tazî bimînim !

Rovî dengê xwe bilind kir û gotê :

- Guhdariya min bike ! Min ji te re çi got, wisan bike ! Karê te jî bi tu tiştekî din tune ye !

Qerêş bi a rovî kir. Wî kincên xwe di avê de ber dan û pişt re jî kete çêm, ku serê xwe bişo. Rovî jî derbazî aliyê din yê çêm bû.

Li aliyê din yê çêm eşireke koçer e gelekî mezin derketibû zozanan. Koçeran konên res̄ yêne mezin vegirtibûn û pezên xwe jî berdabûn berpala çiyê, nav çêra hêşîn. Rovî salixê serekê eşirê wergirt û rasterast berê xwe da dîwana wî. Derket hizûra serekeşîr û gotê :

- Paşe, malava, Toz Beg tevî êl û eşireta xwe hatin, ku werin cem te. Lî hem eşiret û hem jî xelkê wî li ber avê çûn û ew bi xwe jî, şilf û tazî, li ber çêm bi tenê maye. Ma tu bi hawariya wî de naçî ?

Gava ku serekeşîr ev gotinbihîstin, bi lez û bez, tevdîra çek, hesp û lazimî kir û ew şandin da ku Toz Beg, ano qerêş, bînin. Desteke siwarî çû, Toz Beg hilda û anî zozanê û ew li warê koçeran cîwar kir.

Du-sê meh derbaz bûn. Rojekê rovî derket hizûra serekeşîr û gotê :



- Paşe, Xwedê ji te razî be. Bila dewlet her li serê te be û bila Xwedê tu kemasiyê ne ke para te. Ev hinde roj û meh in, ku em hatine û bûne mevanên te. Lê tu qet napir sî, ku gelo Toz Beg ji bo çi hatiye cem te ?

Serekeşîr :

- Em eşîr in. Ne ji tora me ye, ku em kêfa mîvanên xwe birevînin û wan aciz bikin... Hun ji wir heta bi vir, bi ser seran û

bi ser çavan re hatine. Madem ku Toz Beg ji bo meremekê hatiye, ka bêje, gelo rema dilê Toz Beg ci ye!

Rovî :

- A rastî ev e, ku Toz Beg ji bo ku bi emrê Xwedê û bi qewlên Pêxemberan keça te ji xwe re bixwaze, ketiye ber hinde rençê û zehmetiyê û hatiye ba te.

Serekeşîr kêlikê ji xwe re hizirî û paşê gotê :

- Hun gelekî bi xêr hatin, bi ser seran û çavan re hatin. Xuya ye, ku Toz Beg ji bo xatirê keça min êl,leşker û xelkê xwe winda kiriye. Heke ez keça xwe nedim wî, ez ê bidim kê. Ez im û keçeke min e, bila ew jî ji Toz beg re gorî be.

Ji Toz Beg re daweteke ges û giran li dar xistin. Wisan ku tam çel roj û çel şevan domand. Di van çil şev û çel rojan de wan xwarin,vexwarin û dîl kirin..

Di ser dawetê re çend meh derbaz bûn. Rojekê rovî Toz Beg bi xwe re bir dîwanê. Di dîwanê de ci vateke giran hatibû li dar xistin. Dengbêjan dis tiran û diavêtin ber hev. Ji nişkê ve bêdengiyek kete nava civatê. Ev ji rovî re bû delîveke hêja. Hema ji serekeşîr destûr xwast û dest bi pey vînê kir û got :

- Paşeyê me, êdî me dil heye,ku em destûra xwe ji te bixwazin. Ev bûn çendî çend me-



hêñ me, ku me nanê te xwar û ava te vex-war. Bi ser de jî, me merema dilê Toz Beg anî cîh. Bila war û ocaxa te şen û domdar be. Lê ji hatiya re çûn û ji mayiyan re jî rehetî hewce ye. Ne ku bêhna me li ba te, êl û eşireta te teng dibe. Na, lê em jî xwedî mal û war in, xwedî zar û zêç in. Niha çavêñ wan di riya me de گerimîne...

Rovî hîn gotinêñ xwe neqedandibûn, Toz Beg ew qu rince kir û bi lez serê xwe ber bi guhê wî de çemand. Devê xwe xiste guhê rovî û bi dengekî nizim jê re got :

- Lawo, hey min xêr jê nedîtiyo ! Ev ci sos ret e, ku tu dixwazî bînî serên me ? Hey kurdünde û warwinde, ci bi vir hatiye? Re hetiya me di şûnê de ye. Ava me belaş, nanê me belaş. Ma Xwedê ji me standiye, ku em dev ji vir berbidin û dakevin çol û be yaran ? Hey bêmêjiyo, dê tu berê me bidî kîjan aliyî û dê tu me bi kû de bibî ? Ma em ê vejerin aşê xwe û tê de gora xwe bikolin ?..

Rovî bi hêrs ket û lepê xwe avête guhê Toz Beg û ber bi xwe rakêşand û tê de got :

- Guhdariya min bike ! Min ji te re ci got, wisan bike ! Karê te ji bi tu tiştekî din tune ye !

Wan ji serekeşîr destûr wergirtin. Sibetirê zû rabûn û karê rêwîtiya xwe kirin... Barê çel hêstiran(qantiran) tiştên giranbiha li heywanan bar kirin. Li hespêñ xwe siwar bûn, teví cihêzê bûkê û leşkerekî giran bi rê ketin...

Bi qasî qonaxa pênc-şeş rojan rê çûn. Lê rovî her tim li pêşıya karwên diçû... Rovî gihişt kerîk pezê pir mezin. Ber bi şivanê pêz çû, jê pirs kir û got :

- Ev pezê kê ye ?

Şivên lê vegerand :

- Ev pez, pezê Pîra Hût e !

Rovî gotê :

- Va ye Toz Beg bi leşkerê xwe ve têñ. Dê ji te bipirsin, ku ev pezê kê ye. Divê tu bê jî, ku ev pez pezê Toz Beg e. Yan na, bi Xwedê, ew ê serê te jêbikin.

Pişt re rovî rastî garaneke ga û çêlekan hat. Çû ba gavêñ û li, wî jî wilo qewîti kir. Bi dû re ras tî kerîk berx hat û ji berxvan re jî wisan got. Paşê rastî garana hêstiran(deve) hat û li gavanê garanê hêstiran jî wilo qewîti kir... Vêca gava Toz Beg û koma wî ji wan dipirsin, wan jî herwe kî rovî li wan qewîti kiribû, bersiv didan û di gotin :

- Ev pez, pezê Toz Beg e.

- Ev garan, garana Toz Beg e.

- Ev kerî, keriyê Toz Beg e.

- Û ev ...

Her çi gava ku leşkerêñ Toz Beg û bûka xatûn ev bersiv dibihîstin, dev li wan vekerî diman û bi xwe ji xwe re digotin, ku "Irrr... Ev Toz Beg çi gasî dewlemend e !..."

Rovî xwe bi lez gihande Pîra Hût. Pîra Hût gele kî maldar û dewlemend bû. Konê ku tê de rûdinişt pir mezin bû û li ser heft stûnan vegirtî bû. De ma ku rovî xwe gihande Pîra Hût, bi qestîka ve , kir helehel û jê re got :

- Dapîra delal, va ye Toz Beg bi leşkerekî giran ve ber bi te têñ. Ew her kê ku dibînin, dikujin. Min ev yeka bi çavêñ xwe ve dîtin. Tu dizanî ku ez ji te pir hez dikim. Ji lew re gunehê min bi te hat. Min bi xwe ji xwe re got, ku ez baz bidim da ku dapîra xwe ya çeleng ji vê qewmandina reş a giran pê bihisînim. Ji ber vê yekê, tu were gura min bike, ku berî ew werin vir tu xwe veşêre. Heyfa te delalê ye, da ku te jî nekujin...

Pîra Hût baweriya xwe bi rovî anî û gotê :

- Baş e, bila mala te ava be! Lê ka ez ê ci lo xwe veşêrim û ez ê xwe têxim kû ?

Rovî lê vegerand :

- Hema xwe têxe nav vê loda ha ya pûş !

Pîrê bi a rovî kir û xwe xiste nava loda pûş. Rovî jî rabû agirek pêxist û berda lodê. Pîra Hût şewitî û bû mistek rijî. Vêca Rovî rabû konê Pîra Hût ji Toz Beg û koma wî re hazir kir. Bi vî a wayî Toz Beg bû xwedî kon, pez û dewar, mal û sâ man(milk) jî.

Êdî kêf, kêfa Toz Beg bû. Ew her roj sibehê zû ji xwe re diçû nêçîra gakûviyan, pezkûviyan û êvarê bi derengî ji nêçîrê vedigeriya... Çend mehêñ din jî bi vî rengî derbaz bûn. Rojekê rovî ji xa tûnê re got :

- Xatûn, iro êvarê, gava ku Toz Beg ji nêçî



rê vegere, ez ê xwe bi henekî bi mirarî  
biavêjim. Divê tu ji Toz Beg re bêjî, ku  
roviyê me mirar bûye. Çika em binihêrin  
Toz Beg çi dibêje !

Wan gotina xwe kir yek... Êvarê, gava ku Toz Beg  
vegeriya, xatûnê gotê :

- Mêrik, ma ne îro rovîkê me mirar bû !

Toz Beg ji nişkê ve veciniqî û gotê :

- Bera ?.. È, de bi boçika(terî) wî ve bigire û biavêje ser sergo !

Wextê ku Toz Beg wilo got, rovî ji cîhê xwe rabû û berê xwe da ber bi Toz Beg. Bi dengekî bilind bi ser de qêrî û got :

- Hey gidî qeraşê diho !

Dema ku xatûnê gotina qeraş ji devê rovî bihîst, li Toz Beg vege riya û bi hêrs jê re got :

- Çiii ... Tu qeras î ? Madem wisan e, ez ê a vê gavê herim mala bavê xwe ! Ez keça paşekî bi navûdeng im, çawan dibe ku bibim jina qeraşekî wek te ?

Hema xatûnê buxçe, pirtî û palazên xwe civandine hev, rahişte wan û berê xwe da ber bi mala bavê xwe. Lê gava Toz Beg dît, ku jinik çû, vêca rabû û li ber dilê rovî geriya. Lava lê kir û got :

- Birakê rovî, ez bi qurbana te bim. Bi Xwedê min henek kir û min ji dil negot. Ez ke time ber bextê te û ez xwe diavêjime binê lingên te. Hema mala min wêran neke, tu çi bixwazî ez ê gorî te bikim. Bes ku bixwaze. De ez toz, gil û gemara binê lingên te. Ci dibe, here jinika min vege riye !..

Toz Beg pir li ber dilê rovî geriya. Di dawiyê de rovî got :

- De xem nake ! Ez ê vê qenciyê jî li te bikim !..

Rovî baz da û çû pêsiya xatûnê. Xwe gihande xatûnê û gotê :

- Ji min re digotin, lê bi rastî min pir bawer nedikir, ku jin hinde diltenik, zûbawer û bidudilî ne. Lê malxirabê, min ji kû ji Toz Beg re got "qeraş" ?

Xatûnê lê vegerand :

- Belê, te got "qeraş".

Rovî gotê :

- Na xatûn, min jê re negot "qeraş". Min jê re got, ku xwediyyê milk û aş !

Em serê we niêşînin, rovî jinik qanîh kir û wî ew bi xwe re vegerand cem Toz Beg.


Rojekê rovî bi rastî mirar bû. Çaxa ku Toz Beg ji nêçîrê vegeriya, xatûnê jê re got :

-Mêrik, ma ne rovîkê me îro mirar bû !

Toz Beg hema dest bi giriyyê kir. Sê roj û sê şevan her giriya, li xwe xist û porê xwe rûçikand.. Êdì bêhn jî ketibû rovî. Gava Toz Beg dît, ku rovî hişyar nabe û bêhnê jî der û dor rapêçaye, êdì bawer dike, ku bi rastî jî rovî mirar mûye...

Cûka me firî û çû danî serê darê,

Em bi hev re, bi xweşî bigihêñ biharê.



Qaremanê miletê Kurd tev karker û cotkar in,  
Dijminê koledar û dost û hevalên azadîxwaz in.

*Cegerxwîn*



CÊWRIKA RÊNEZAN



Ev cêwrika ha, di nav toreke ji têlê hatiye çêkîrî de maye. Dike nake, nikare riya xwe bibîne û jê derbikeve. Gelo tu dikarî alîkariya wê bikî û rê nîşanî wê bidî ?




## SIWARÊ BÛKÊ Û MÛRÎ

Kêfê - eşqê,  
Siwarê bûkê,  
Tam havînê,  
Ket şabûnê,  
Geriya, stra,  
Kire çirîn  
Û nişkê ve  
Roj lê firîn.  
Zivistan hat,  
Der - best nixamt.  
Çûn dabirîn  
Tav û havîn,  
Gîhêd hêşîn  
Nan û star,  
Siwar ma bêçar.

Sur û sermê,  
Birçîbûnê,  
Deng - sewtê wî  
Dan birînê.  
Û ricifîn dev - diran,  
Sibekê zû, bê heyam.  
Wê sur - sermê siwar rabû  
Ber bi mala mûriyê çû.  
- Inka delal, ez qurban !  
Ez birçî me, bêwar mam:  
Min re bike tu çare,  
Belku derêm biharê.  
- Olo, ew çi gili ne ?  
Merî te şas dimine.  
Min re bêje wê maenê,  
Nexebiti havînê ?  
- De wextê kê dê hebûya,  
Wê havînê bixebitiya.  
Nava gul û gîhê de  
Tev hevala min distira.  
-Û xuya ye tu ?...  
- Belê ez,  
Havînê her ger û bez,  
Nav zeviya û sînora  
Her roj, her roj min distira.  
- Te distira ... De zehf pak.  
Niha jî bike waqe waq.

M I J Ü L İ

KÜP



Gelo ev kûpa ha, ji çend perçe têlan hatiye çêkirin ? Qenc lê mîze bike û pişt re bersivê bide !

## VEJANDINA ZIMANÊ KURDÎ

Wek hun jî dizanin, di zimanê kurdî de, pir curên (celeb, texlît) tiştan hene. Zimanê me ji vî alî de gelekî dewlemend e.

Emî ê niha li vê jêrê navêñ hin curêñ tiriyan binivîsin. Lê em bawer in, ku hin curêñ din jî he-  
ne, ku me nenivîsandine. Yan jî hin ji van navêñ jêrîn wek hev bin. Ji ber vê yekê, heke hun biza-  
nin ku hin ji van navan wek hev in, yan jî hin cu-  
rêñ din yêñ me nenivîsandî hene, ji keremên xwe  
re, me agehdar bikin. Wan ji me re binivîsinin û  
rêbikin, da ku em wan çap û belav bikin. Herweha,  
em ji we hêvî dikan, ku hun navêñ curêñ tiştêñ  
din jî ji me re binivîsin û bişînin. Em ê bi vê  
riyê zimanê xwe bidin vejandin, wî pêşdetir bibin  
û bi ser de jî hin gotinan ji windabûnê xelas bi-  
kin.

- |                      |                   |
|----------------------|-------------------|
| 1- Hesenî            | 12- Helesor       |
| 2- Nikilqijak        | 13- Sorave        |
| 3- Werdan            | 14- Tilîgir       |
| 4- Reşê werdan       | 16- Şîre          |
| 5- Tiriyê şerabê     | 17- Kirot         |
| 6- Sor,sorik,libsov  | 18- Rohnik,ruhnik |
| 7- Subhanî           | 19- Hetfî, etfî   |
| 8- Koxer             | 20- Şilfonî, avî  |
| 9- Tayîfî            | 21- Hêşîn         |
| 10- Reş,reşik,libres | 22- Mize          |
| 11- Eqeybî           | 23- Hebobengî     |

24- Reşê mîsebiq	50- Temûzî
25- Mîsebiq	51- Libgolik
26- Xûriz	52- Bilbîzêqî
27- Qeysî	53- Sincêrî
28- Mizînî	54- Nosirk
29- Dukolgan	55- Guncikî
30- Şî	56- Reşê mîwîjan
31- Himsî	57- Reşê kevnar
32- Tiliya xatûnê,tilîxatûn, tirîdirêj	58- Reşê guhap
33- Dizêran	59- Nehmik
34- Zeynebî	60- Libdirêj,dirêjîl
35- Sorê mîranî,sorê mîrî	61- Gurna,gurnikî, gurnik,deywani
36- Şitû,şitwî	62- Reşê şerabê
37- Sultanî	63- Beqerî
38- Zeytî,gewre,zerik	64- Mîranî,mîranî
39- Kerkûş	65- Reşmîw
40- Reşê kerkûş	66- Mirmirk
41- Merzone,marzûme,merzûne, mezromî,mezrûmî	67- Kişmiş
42- Qırfok, qurfok	68- Kırkirk
43- Ternebî,tehlnebî,talnewî	69- Çavga
44- Helebî	70- Bêsiranî
45- Bêsnî,Bêsnîyê	71- Guhana bizinê
46- Heftnifşî, heftcar	72- Zerik
47- Balîcanî	73- Şamî
48- Merîr	
49- Çivîkan, çûçikan	

Ax û oxêñ min ji dil têñ, ew ji ber tîra qizil têñ  
Yan ji kovanêñ di kul têñ, jê dizêñ her xwîn û zox

*Melayê CIZÎRÎ*



# M A M I K

1. Ser piçûkê dêl dirêj,  
Ew şêlim e, kevirê gêj.

- - - - -

2. Tiştek heye dar e, ne dar e,  
Belçikê darê çil hezar e,  
Gotin heye bê hejmar e.

- - - - - - - - - -

3. Tiştekî min heye,  
Xwîşka min a hilgustan,  
Çil dergûşen ser destan,  
Ne ber e, ne bistan.

- - - - -

4. Tiştekî min heye,  
Dikişe, ne mar e,  
Dimike, ne kar e,  
Pişt kovik e, sîng dar e.

- - - - -


5. Rojê betili, şevê xemili.

- - - - -

3- Mirîsk, 4- Kâsi, 5- Cîra

BERSTİV : 1- Şêlim, 2- Delbîjîyên hespan,

# M I J Ü L İ



Gelo navê vî mîrî çi ye ?

Tîpêñ ku navê wî jê pêk têñ, li ser çav û rû-yê wî belavkirî ne. Heke tu wan tîpan bigihî-nî hev û lê bixebeitî, dê tu navê wî derbixî.

# XERİBÊ

Notenivts: Cemîla Celîl

Moderato

The musical score consists of three staves of music. The first two staves are in 2/4 time, and the third staff is in 3/4 time. The lyrics are written below the notes. The vocal line starts with 'Xe . ri . ba' and continues through several lines of text, ending with 'bê.' The melody features eighth and sixteenth note patterns.

Xe . ri . ba      min      bî . rin,      bî . rin,      piş . ta      heft  
çîa . da      xar      ki . rin,      wey, xe . ri -      bê,      wey, xe .  
- ri . bê,      wey,      wey,      wey, xe . ri -      bê.

Xerîba min birin, birin,  
Piştâ heft çiyan de xar kirin,  
Wey xerîbê, wey Xerîbê,  
Wey, wey, wey Xerîbê.

Xaniyê xerîba min çal e,  
Dilopa tê de nale-nal e,  
Xerîb digirî zava î kal e,  
Wey, wey, wey Xerîbê.

Xaniyê Xerîba min kort e,  
Dilopa tê de şorte-şort e,  
Xerîb negirî zava î xort e,  
Wey, wey, wey Xerîbê.

Cîngê Xerîba xwe hiltînim,  
Neynika wê di bin de dibînim,  
Hûr hûr hêşiran dibarînim,  
Wey, wey, wey Xerîbê.

Sazbend hatin devê aşê,  
Qeytan dane ber qumaşê,  
Xerîb negirî xwîşka padişê,  
Wey, wey, wey Xerîbê.



Îsal di gundê me de ava bûye dibistan.  
Em tev tê de dixwînin, qelem-defter di destan.  
Dixebeitin em her gav, nizanin çi ye westan.  
Çiqas xweş e ev xwendin ! Bijî,bijî dibistan !

M.E. BOZARSLAN

# M I J U L I

## YÊ DI MÊRGÊ DE



Gelo çi di mêrgê de dibeze ? Heke tu hejmaran ye  
 ko-yeko bigihînî hev, tu dê bizanibî ku ew çi ye.  
 Lê ji hejmara l-ê dest pê bike û li gor rêzê he-  
 ta bi 60-î here !

## PİRA EYSE Ü GAVAN

Çeleka pîra Eyşê  
Îro nehati bû mal  
Pîra Eyşê ji ber wê  
Digirya, dikir hawar

Lê paşê pîra Eyşê  
Rahişte gopalê xwe  
Zûka derket ji hewşê  
Çû mala gavanê gund

Gavan ser şîvê de bû  
Pîra Eyşê ket hundir  
Çavêن gavêن beloq bû  
Gava pîrê pirs jê kir




Pîrê gopal hilda jor  
Ser gavêن de qîriya  
Bo çeleka xwe ya sor  
Hîna jî digiriya

Gavêن bi herdu destan  
Xwe ji pîrê zû parast  
Ew di cî de rawestand  
Jê re got gotina rast

Gavan got: Pîra Eyşê,  
Çeleka te hate gund.  
Ka her binêr li hewşê!  
Tu binêre baş û rind!

Zû derket pîra Eyşê  
Wê berê xwe da malê  
Dît ku çelek li hewşê  
Mexel e li ber darê.

# XƏÇEPIRS



## RÊZIMAN Û RASTNIVÎSANDINA KURDİ

Dûma hîka hej. 2

Gava ku di peyvekê de tîpa -û- bête pêşıya tîpa -y-, hem bilêvkirin û hem jî nivîsandina wê peyvê tête guhartin. Dengên -ûy- dibin -iw-. Wek:

Tû	<i>lê</i>	<u>Tiwê</u> darê
Rû	<i>lê</i>	<u>Riwê</u> min
Dû	<i>lê</i>	<u>Diwê</u> sobê

Tiwên dara mala Gurgîn reş in.

Wan riwên me reş kîrin.

Diwên soban ber bi asmên hildikişin. işe.

Herweha lêker jî wek qayîdeya jorîn têne guhartin û nivîsandin. Wek:

Heke perê min hebiwa ...

Heke ew Gurgîn biwa ...

Heke Sorgul keti biwa ...

Lê belê di piraniya devokêna zaravayê kurmancî de ev qayîde nayê bi kar anîn. Heye ku hatibe pişaf tin û winda bûbe. Kurmancêna ku vê qayîdeyê hîç bi kar naynin, bêtir dengên -ûy- bi kar tînin. A-no, peyvê qet naguhirînin. Wek:

Tû	Tûyê darê
Rû	Rûyê min
Dû	Dûyê sobê

Tûyêñ dara mala Gurgîn reş in.

Wan rûyêñ me reş kirin.

Dûyêñ soban ber bi asmêñ hildikişin.

Herweha ew lêkeran jî wisan dawî tînin. Wek:

Heke perê min hebûya ...

Heke ew Gurgîn bûya ...

Heke Sorgul keti bûya ...

Dibe ku bête pirsîn, ku ma bi vî awayî nivîsan-din ne rastir e ? Piçekî zor e, ku mirov bêje belê. Madem ku ji bo dengdarêñ -ê- û -î- qayîdeyek hebû, divê qayîdeyek ji bo dengdara dirêj -û- ji hebe. Wek me li jorê jî nîşan da, ev qayîde heye û tête bi kar anîn. Bi qasî hindê jî, di vî warî de pirseke din tête pêşıya me. Gelo em ê peyvîn wek bûyer, xûy û hwd. û herweha nav û peyvîn biyanî(dereke) çawan binivîsin ?

Bi kurtebirî, em niha nikarin bi awakî misoger bêjin, ku weha rast e û wilo şaş e. Bi a me, divê civateke zanistî, ku ji zimanzanêñ kurdî pêk bêt, bête saz kirin. Ew hem li ser vê pirsgirêkê û hem jî li ser pirsgirêkêñ din, yêñ ku di zimanê kurdî de hene, biryarê bide. Ev ji bo yekîtiya nivîsandina zimanê kurdî pir hewce û girîng e.





## BERSIVA PIRSEN HEJMARA DIDWAN YA KULILKÊ

Têbînî : Ji ber şaşıya nivîsandinê, di hejmara didwan de, du şaşiyên mezin hatine ki rin. 1)- Di şûna hejmar 2 de, hejmar 1 hatiye nivîsandin. 2)-Di rûpela 11 an û rêza ji jêr ve ya didwan de peyva hev ketiye. Divê dawiya wê rêzê "bi-gihînî hev ..." be. Em hêvîdar in, ku hun li vê kêmasiya me biborin.

---

MIJÜLÎ - rûpel: 11


BERSIV : KOCER

XACEPIRS - rûpel: 28

BERSIV :

XACEPIRS

①	B	E	R	G	A	V	K
②	G	U	R	Z			
③	P	A	L	I	K		
④	S	I	W	A	N		
⑤	N	I	K	I	L		
⑥	N	I	G	A	K	U	V
⑦	I	K	E	R	A	Z	T
⑧	A	M	H	E	Z	I	N
⑨	M	O	S	E			
⑩	D	I	Y	A	R	T	
⑪	S	A	L	N	A	M	E





PRIS : 10:- skr  
BIHA

## HA GULA ZER

Notenivts: Cemîla Celîl

Allegro

Ha gula zer, can gula zer,  
Ha zeriyê, zeriyê.

Ha gula zer, can gula zer,  
Ha zeriyê, zeriyê.

Ha gula zer, can gula zer,  
Ne çaz im, ne quling im.

Ha gula zer, can gula zer,  
Ne şêr im, ne piling im.

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM  
SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0